

HEVBIRATÎYA T'OROSAN: SEMBOLA HÊVÎYÊN QENC, AN XEWN Û XIYALÊN BÊDAWÎ?

*R'astîyek a tal
ji hezar derewên şêrîn çêtir e!
(Gotina pêşîyan)*

Ezîz ê Cewo

Piştî weşana gotara min a “Paradok’sa dîrokê. Çawa agahîyên di derbarê Sêlava Cîhanî da berovajî kirine”¹, xwendevanan hem li hember destaneya kevnar a gelêrî ya navdar, hem jî li hember daneyên dîrokî, bûyerên cîhana kevnar, ên ku di gotarê da dihatin nirxandin, û şiroveyên wan ji hêla lêgerîner û nivîsk’arên cuda va, baldarîyek a zêndî dan xuyan. Helbet, hema di sêrî da helwesteke weha ya hestiyarî dhat hêvîkirin: di nava hinekan da baldarîyekê li hemnbar mijarê r’û da, hêvîyên hinekan şkestibûn, şirove û r’avekirinên bûyerên dîrokî yên ji hêla hinek dîrokan û nivîsk’aran va nedik’etin serê hinekan, ewana ew wek dîllêma diditin... Her mirovek r’astîya xwe hebû! Lewra jî, zorayêl (parallêl) bi wan baldarîyan, helwestan, hêvîşkestinan û têbînîyên cuda r’a, li bal xwendevanan wisa jî pirsên cuda r’û dabûn! Pirs p’ir’ bûn. Erê, ewana di derbarê aspêktên cuda yên r’avekirina mijarê da bûn, lêbelê, p’ir’anîya wan, bi bingehîn, heman pirsgirêkên têgihîştina mijarê destnîşan dikirin, lewra jî min ji wan her ew hîlbijartin, ên ku p’ir’î-hindikî zelal şewazdarkirî dihatin xuyan, ji bilî wê, hem jî bêhtir konkrêt bûn û li ser babetekê pêk hanibûn.

Weha, *Sedo Mûsoyan* ji bajarê Ykatêrîbûrgê yê Fêdêratsîona R’ûssîyayê ner’azîbûna xwe weha tîne zimên: “... Hûn çima li dora pirsê dizivir’in, lê r’aster’ast nabêjin? Ev gotinên We tîne çî wat’eyê: “...*emê îro t’enê di wê derbarê da biaxivin, a ku di vê p’irtûkê da di derbarê Sêlava Cîhanî û Nuh P’êxember da hatye nivîsîn, û emê heya di derbarê şiroveyên xudanê p’irtûkê da neaxivin, lewra ku, ew nak’ave nava pirsên mijara vê gotarê*”. – Hûn bi van gotinan çî dixwazin bibêjin? Çima Hûn xwe ji ber şiroveyên r’astedêr ên pirsên konkrêt didin hêlekê? Ma ne, li wira pirsên ku mirov dikaribû li ser wan gengeşî pêk bianyana, hene?” – Minrov bi boneya vê pirsê çî dikaribû bigota?

Helbet, wek ku tê xyan, ku li bal xwendevanê hêja pirs k’etine ser hev, û ewî dixwast, bersîvên wan, wek ku tê gotin, hema li vira û naha bibihîstana. Lêbelê, ew bi xwe jî gotinên ji gotara navborî tîne: “...*emê îro t’enê di wê derbarê da biaxivin, a ku di vê p’irtûkê da di derbarê Sêlava Cîhanî û Nuh P’êxember da hatye nivîsîn...*” – Ango, armanca wê gotarê t’enê nirxandina pirsên p’êwendîdarî destaneya gelêrî ya di derbarê *Sêlava Cîhanî û Nuh P’êxember* da ye di wê p’irtûkê da. Hew! Lêbelê, bi vê r’a t’evayî, wisa jî hatye gotin, ku: “... *ji M. Mînyan r’a li hev nehatye, ji bo hemû pirsan bersîvên bi zanistî misoger bibîne, lê ew, ya ku wî di dema xwe da nivîsye, îro jî dikare bibe alîk’ar, ku mirov bikaribe bersîva pirsên di derbarê wan pêvajoyên civakî-siyasî da bibîne, yên ku îro jî di herêmê da û li dora wê pêk tîne. Ew ji bo dîtina û aspêktên cuda yên nirxandina wan pirsan, ên ku demên cuda r’ûdidin, ç’avkanîyek a bi nirx e. Helbet, li wir hinek pirs û kont’sêpt jî hene, û di derbarê wan da mirov dikaribû bi nivîsk’ar r’a gengeşî pêkbanya... Hemma, ew babeta axavtineke dinê ye. Û wê demê jî mirov dikaribû li ser bingeha dahûrîna (analîz) r’exneyî bersîva gelek pirsên dîrokî, çandî û civakî-siyasî bidîta...!*” – Va, bi dîtina min, hema di sêrî da li vira bersîva wan pirsan hebûye, yên ku dikaribûn piştî weşana gotarê r’ûbidina, di nava wan da, wisa jî bersîva pirsên *Sedoyê* hêja.

Û ev jî ne hemû ye. Di vê gotarê da xwendevanê her weha bersîvên pirsên dine jî, yên

¹ https://www.academia.edu/121111925/PARADOKS_A_DÎROKÊ_ÇAWA_AGAHÎYÊN_DI_DERBARÊ_SÊLAVA_CÎHANÎ_DA_BEROVAJÎ_KIRINE ; https://www.amidakurd.net/ku/tekst/PARADOK_S_A_DÎROKÊ

ku bala wan dik'ışînin, bibînin, û, helbet, li bal wan dê pirsên nû jî r'ûbidin...

Lê *Anûş Bablûmyan* jî Yêrêvanê bi gef û gur' matmabûna xwe tîne zimên: "... *We ew ji k'u anî, ku Ararat, welatê me yê kevnar û çîyayê Ararat di Kurdistanê da ne? Tiştêkî weha çawa dikaribû bihata ber heşê We?*" – Ezê li vir bilezînim, xanima hêja agahdar bikim, ku, ya yekem, ew ne gotinên min in, ewana jî hêla lêger'înerê ermenî yê destpêka sedsal XX M. Mînasyan va hatine nivîsîn, û min jî ew ji ber p'irtûka wî girtine. Nivîsk'ar jî ew gotin ji esmanan hilnedane, ew bi xwe dide xuyan, ku wî ew ji ç'avkanîyên cuda hildane, di nava wan da, wisa jî, ji ç'avkanîyên kevnar, ew jî ne t'enê ji yên ermenîyan. Lê, eger di wê derbarê da min binivîsya, minê ne ku wisa, lê bi şewazekî dinê bigota. Û di wê derbarê da jî delîl hene: hê sala 2016-an min dîtina xwe di derbarê dyarbûna heman nêzîkbûnê li hember pirsên mijara gotinê yên di r'ojên me da nivîsye.² Ya duyem, dibe ku, *Anûşa* hêja, piştî xwendina van p'eyvan wisa t'evlihev bûye, ku destûr nedaye xwe, ji wir û wêva jî bixwîne. Lê li wira gotinên ji p'irtûka navborî ya heman nivîsk'arî hene. Weha ew gotin: "*Profêsor K'êrovbê Patkanyan jimêjva îzbat kirye, ku navê Ararat van demên dawîyê danîne ser ç'îyayê Masîs, ê ku li besta ç'emê Arak'sê ye (Erez). Û, ku ew welat, ê ku gelên samî, bi t'aybet jî, Încilê, Ararat navkirine, li derdorên derya Wanê bûye. Bi nêr'îna profêsor Gêlt'sêr, heya sedsala XI an X ev p'evguhar'tina navan nikaribûye pêk bê, ango, ew her weke hezar salî berê pêk hatye. Di "Dîrok" a Pavstos Byûzand da êdî zelal tê gotin, ku di welatê Kordan (Kurdistanê) da warê Ararat hebûye û li wira jî – Çîyayê Ararat, ku li ser vî çîyayî jî k'êştîya Nuh r'awestyaye. Ew heman ç'îyayê Ararat e, yê ku di lêgêndên zarkî da wek cîyê r'awestana k'êştîya Nuh P'êxember tê bîranîn, û Mûsayê Xorênî (Movsês Xorênat'sî) jî ew berev kiribûne û nivîsibûne. Û di P'irtûka Afirandinê da jî di wê derbarê da tê gotin, ku ç'îyayê Araratê, yê ku di herêma Kordan da ye, di dîroka Sêlavê da tê bîranîn...*"³ – Wisa jî di beşê destpêkê yê gotara navborî da⁴ jî ji p'irtûka lêger'înerê alman ê sedsala XVIII *Îohann Haynrîx Drîmêl* gelek agahîyên balk'êş hene, yên ku dikaribûn t'êra xwe alîk'ar bûna, ku ew cudabêjî, yên ku di şiroveyên M. Mînasyan da dertên holê, bên têgihêştin...

Lê *Stêp'an Barsêxyan* jî herêma Krasnodarê ya Fêdêratsîona R'ûsiyayê dipirse: "*We ew p'irtûk ji k'u derxistye, çima di derbarê wê da heya naha tiştêk ne dyar bû?*"

Pirsek a di cî da ye! Dibersivînim: hê destpêka sala 2022-an dostên ermenî cudaşewazê p'irtûkê yê êlêktronî ji me r'a şandibûn – zor spas ji bo wan! Û ez bi bawer im, ku ev p'irtûka îro jî di p'irtûkxaneyên Ermenîstanê da tê p'arastin. Li ser r'ûpelê yekem ê p'irtûkê şopa moreke bi şewazê hêkanî (oval) ya p'irtûkxaneyekê tê xoyan... Ya kîjanê ye? – Baş naê xuyan, nikarim bibêjim! Lê ez bi bawer im, ku mirov dikare wê bibîne, eger bixwaze. Mirov wisa jî di întêrnêta da dikare lê biger'e... Lê, ew, k'a: "... *çima di derbarê wê da heya naha tiştêk ne dyar bû?*" – Ew pirs ne ji bo mine.

Lêbelê, divê bê gotin, dema mirov p'irtûka M. Mînasyan a "Hevbiratîya T'orosan" dixwîne, dilê wî dêşe û ew ber xwe dik'ewe, ku ç'avkanîyeke wisa ya hêja t'am dewrekê (sedsalekê) li ser r'efên p'irtûkxaneyan t'oz û xubar girtye, û kesekî heya "dîna xwe jî nedayê" (divê bê gotin, wisa jî gelek p'irtûk û destnivîsên nivîsk'arên ermenî hêjayî heman ç'arenûsê bûne, di nava wan da wisa jî, p'irtûka p'ir' bi nîrx a *Sîon Vardapêt Têr-Manvêlyan* a "Kurmanjên êzdî", ya ku sala 1910-an hatbûye weşandin, heya ku di dema xwe da gotara min di derbarê wê da dernek'et r'onahîyê⁵). Û ya ku mirov dilmayî dike jî, ew e, ku r'ewşeke weha wê demê desthilatdar bûye, dema di nava sazîya Înstîtûta r'ojilatzanîyê ya Akadîmîa

² Dîtina xwe di derbarê vê pirsgirêkê û pirsên dinê, yên pêwendîdarî wê da, min hê di sala 2016-an di gotara xwe ya "Dîlêma dîrokî, yan îdêa fik's?" da r'êz kirye. – <https://www.amidakurd.net/pel/DÎLÊMA-DÎROKÎ-YAN-ÎDÊA-FÎKS-1.pdf>.

³ Մ. Միսսսեան, «Տաւրոսեան եղբայրակցութիւնը». Ֆրէզո – 1923 թ., էջ 3 – 5. // *M. Mînasyan*, "Hevbiratîya T'orosan". Frêzno – s. 1923., r'û.: 3 – 5.

⁴ Li nasîya 1. binihêr'in.

⁵ Di derbarê vê p'irtûka balk'êş da–di gotara: "Ezdazanê ermenî yê destpêka sedsala XX di derbarê êzdîyan û êzdîtiyê da" – https://www.amidakurd.net/ku/tekst/ezdazanê_ermenî_yê

Zanistê ya Ermenîstana Sovtê da beşê k'urdzanîyê hebûye (yê ku demekê heya pêr'a jî gîhandye, bibe şaxekî cuda), dema Ermenîstan Sovêtî yek ji navendên k'urdzanîyê û çanda k'urdî bûye bi giştî di cîhanê da...

Û ev ne hemû ye!

Wisa jî *R'eşîd ê Xudêda* ji Kanadayê dixwaze bersîva pirsên xwe bibîne: “*Dibe ku Hûn ji me r'a bibêjin, – ew dipirse, – k'a ev gotinên Mînasyan tèn çî wat'eyê: “... demekê berê min di p'irtûka Léo ya “Dîroka Ermenîstanê” da îzbatîya di wê derbarê da dît, ku welatê me Ararata kevnar û ç'îyayê Araratê di nava K'urdistanê da ne”. – Mîrov vê çawa tê bigihîje? Ma ne, ew bi xwe dinivîse, ku: “Hemû binecîyên kevnar ên K'urdistanê û Navç'emkê (Mêzopotamîyayê) bawer dikirin, ku k'eştîya Nuh P'êxember li ser vî ç'îyayî r'awestyaye. Nivîsa Pîroz jî Ç'îyarêza K'urdistanê destnîşan dike, dema dibêje, ku k'eştî li ser ç'îyayên Araratan r'awestyaye. Û di ç'avkanîyên xaldêyîyan (keldanîyan) û asorîyan da jî wî ç'îyayî wek cîyê pêkhatina bûyerê destnîşan dikin...” – Û piştî van hemûyan mîrov tiştêkî weha binivîse?!*

Nizanin, nak'okîyeke weha di serê min da cîh nabe!

Û ya dine, wek ku hûn di gotara xwe ya navborî da dinivîsin, ku ... ji dewr û zemanan va tê zanîn, di ç'avkanîyên Încîlê bi xwe da hatye nivîsîn: “*Û keştî li ser ç'îyayên Ararratê r'awestyayê*”⁶, lê dîsa jî hinek lêgerîner û weşanger li ser ya xwe da k'etine û bi bir'yar diinivîsin, xwedêgiravî, k'eştîya Nuh P'êxember li ser ç'îyayê Araratê (Masîs/Agri) r'awestyaye. Û heya hinek fotowênayan jî diweşînin, ên ku, xwedêgiravî, ji balafir'an k'işandine...

Tiştêkî wisa çawa dikare bibe?! Ji k'erema xwe, Hûn dikarin şirove bikin?!”

Mîrov li vira dikaribû çî bigota?!

Bi dîtina min, dema mîrov matêriyalên p'irtûka navborî dinirxîne, divê tiştêkî li ber ç'avan bigire, ku ew zêdetirî sed salî berê hatye nivîsîn. Ku şaxên zanistê, yên wek: *arkêologî, antropologî, palêontologî, gênêtîka, êtnografî* û yên dinê wê demê li ser asteke dinê ya pêşvaçûnê bûne, lê hinek ji wana, heya pêr'a jî negîhandibûne, wek şaxekî zanistê yê cuda û serbixwe pêk bân, ku p'êwendîyên di navbera wan da ewqasî jî pêş neketibûne, ku wan dema r'ewşa civakî-siyasî di herêmedê û t'evahîya cîhanê da bi binva li ser asteke dinê bûne...

Helbet, dê dîsa pirsên xwendevanan r'ûbidin, lewra jî, ji bo ku bersîvên wan heya dawîyê heşmendî bin û bân têgihîştin, em careke dinê berbir'î p'irtûka navborî ya M. Mînasyan bibin, û her piştî wê di goveka (çarç'oveya) mijarê da nirxandinên xwe bidomînin.

Binihêr'in, piştî wê, ku Mînasyan dinivîse, ku hemû binecîyên kevnar ên K'urdistanê û Navç'emkê (Mêzopotamîyayê) bawer dikirin, ku k'eştîya Nuh P'êxember li ser vî ç'îyayî r'awestyaye, ku Nivîsa Pîroz jî Ç'îyarêza K'urdistanê destnîşan dike, dema dibêje, ku k'eştî li ser ç'îyayên Araratan r'awestyaye, ku di ç'avkanîyên xaldêyîyan (keldanîyan) û asorîyan da jî wî ç'îyayî wek cîyê pêkhatina bûyerê destnîşan dikin..., ew li xwe mukur' tê, ku ewî serpêhatîya di derbarê “Gorîdayîna Nuh P'êxember” a li berp'ala ç'îyayê Cûdî da cara yekem di p'irtûka “Dergehên Asyayê” ya zanîyarê amêrikî Worfild da xwendye, ... dinivîse, ku Worfild ji serpêhatîyên di derbarê bûyerên ku li bilindcîya ç'îyayên K'urdistanê pêk hatine bawer kirye, û, ji bo ku di wê da t'am bi bawer bibe, ewî r'êwîtiyek pêk anye û bi xwe zyartevanîya li berp'ala ç'îyayê Cûdî dîtye, û nivîsye, ku her t'enê ermenî wî ç'îyayî Ararat nav dikin, yê ku ji milê başûr va li binat'ara Yêrêvanê ye, û bawer dikin, ku k'eştîya Nuh P'êxember li ser wî ç'îyayî r'awestyaye... – Û peyr'a agahîyên ji ç'avkanîyên ermenîyan tîne

[destpêka sedsala xx di derbarê êzdîyan û êzdîtiyê da](#) ; Rojnameya “Pênûsa nû”, hejmarên 51 û 52 - <http://www.penusanu.com/>

⁶ Бытие 8:4; также: в толкованиях на Бытие 8:4: от Иоанна Златоуста, от Кирилла Александрийского, от Филарета (Дроздова) и др. // Bûyîn 8:4; wisa jî: di şiroveyên Bûyîn 8:4 da: yên ji Îohan ê Zarzêr'în, ji Kîrîl ê Alêk'sandrî (Îskenderî), ji Fîlarêt û yên dinê. Hemû bi r'ûsî ye – <https://bible.by/fater/1/8/4/>

(yên *K'êrovbê Patkanyan, Léo, P'avstos Bûzand, Movsês Xorênat'sî* û h.w.d.), yên ku gotinên Worfeld pesend dikin, lê, yek e, dîsa jî, ew wan hemûyan wek xwe şirove dike...

Lêbelê, bi dîtina min, li vira ne ewqas balk'êş e (an *girîng e*, eger hûn bixwazin!), k'a nivîsk'ar agahîyên ç'avkanîyên cuda çawa şirove dike, lê ew, ku li ser dîmenê (fona) wan agahîyan, şiroveyên wî, bi gotinek a here nerm be jî, ne bawerdar in, û lewra jî di nava xwendevanan da helwesteke weha hişyar dikin, û dibina sedema dahûrandina r'exneyî...

Çi dertê hole, mirovekî nivîsk'ar-lêger'îner, ê ku r'êzepirtûkên weha yên lêger'înî weşandine, r'astîya pirsê têngihîştîye? – Bi r'astî bibêjim, minê heya nexwasta jî, ku, bi gotineke here sivik, tiştêkî wsa bihata ber heşê min. Ew dê tiştêkî mînanî bêr'êzîyê bihata xwyan!

Lewra jî, ji bo destpêkê em li vira du pêşbînîyan binirxînin, ên ku dikaribûn pêkan bûna:

1) an Mînasyan bi xwe nikaribû dijhevî û nak'okîyên dîtînen xwe têngihîştî, lê ew r'ayêl (xet) domandye, lewra ku wê demê mêldaryeke wisa li holê hebûye, û ewî nikaribûye bi şeweyekî dine t'evbigir'e, bi wê hêvîyê, ku paşê xwendevan bi xwe dê têbigihîjin, k'a r'astî li k'u ye, tiştên hinartî, yan lêpovajîkirî – li k'u;

2) an jî, mêldarîyek a weha ya "*zanistî*" ya lêpovajîkirina dîrokê wê demê heş û sewdayên nivîsk'aran û lêger'înerên wisa berbi xwe va k'işandye, ku ewî jî xwe daye wê îdeayê, bi wê hêvîyê, ku xwendevan (û ne t'enê ew!) dê ji wê bawer bikin?

Wek ku tê xuyan, mixabin, hema wisa jî pêk hatye: mêla pêşk'evtînan a weha di r'ojen me da jî didome, û heya bûye r'êgez û pîvana (norm) nirxandina pirsên dîrokî.⁷ Lewra jî, dibe ku, hêja ye, ku mirov bi têngihîştîni li nirxandin û şiroveyên nivîsk'ar binihêr'e, û bicêr'ibîne, di p'irûka wî da wê dendika r'astîyê bibîne, ya ku, bê guman, di wê da heye, her dimîne, ku mirov bi ciddî nêzêkî wî k'arî bibe, ji bo wê zêdetirîn hêz û derfetan k'ar bîne, li ser wê r'êyê çî pîrsgirêk û astengî dibin, bila bibin, wan r'ave û wat'edar bike...

Wisa jî, divê mirov li ber ç'avan bigire, ku dîrokên gelên k'urd û ermenî, xasma van dused salên dawîyê, wisa hatine lêpovajîkirin, ku carana mirov t'irê, r'astîya dîrokî dijwar derê holê, lêbelê, ji hêla dinê va paşer'oja van herdu gelan wisa bi hev hunayî ye, ku carna, qey bibêjî, mirov dijwar bikaribe wan sînoran bibîne, yên ku wana ji hev cuda dikin...

Lewra jî, bi dîtina min, divê dîrokên evan gelan ji vê hêlê va bê pêşdar'êzî û bêyî helwest û dîtînen nehîni yên ç'avgirtî bîn lêger'andin. Dîtin û helwesteke weha ya lêger'îna dîrokên herdu gelên cînar çêker e, pêdivî û daxwezî bi wê hene, û mafê wê yê jîyanê heye.

Û, ya balk'êş ew e, ku, her çiqas, di p'irtûka Mînasyan da gelek caran nak'okî û cudabêjî dertên pêş jî, lêbelê, wek ku tê xuyan, wî bi xwe nikaribûye di r'amandarîyên xwe da negihîje heman dîtînen encamê: "... *Pêwîst e, ku di derbarê dîrok, p'êwendîyên êt'nîkî, bawerîyên olî, daxwez, kesayetî û nîgara gelên cînar da agahîyên r'astîn (cudakirin a min e. – E. C.) bidin gelê ermenî. – Ew nêr'îna xwe weha tîne zimên û didûmîne: – Bilindtirîn berjewendîyên me yên siyasî, êt'nîkî û net'ewî vê daxwez dikin. Piştî dîroka gelê ermenî, an jî, r'asttir dibe, mirov bibêje, zor'ayêlî (parallêl) wê, wisa jî lêger'înen dîroka gelên cînarên me ji bo r'ast p'erwerdekirina nivşên pêşer'ojê mercê herî pêwîst e. Em divê cînarên xwe baş nas bikin û bi xwe jî ji hêla wan va bîn naskirin. Di navbera cînarên bîyanî û nenas da t'imê têngihîştînen şaş, pêşdarazîn, endîşe, hevnextwazî û dijminatî dertên pêş. Yekîtiyên siyasî nikarin herdayîmî bin, eger p'êwendîyên hizirî û r'ewanî û xweşbînîyên êt'nîkî yên li ser asta piştheşî nînbîn. Ji bo me – ermenîyan, xwetêgihîştîna net'ewî ya k'ûr pêwîst e, û ew mercê sereke yê hebûna me ye, ji dîtina wê hêlê va, ku em hemû bi ç'arenûsî bi hev va girêdayî ne, bi t'aybet jî, bi gelên K'urdistanê yên cînarên me r'a...*"⁸ – Belê, bi r'astî jî, ev gotinên Mînasyan ji bo mitaledarên (*intellectuals*) gelê ermenî wek t'emîyekê ne, lêbelê, bijarteyên dinê jî dikarin, p'ara xwe ji wê hilînin, û tiştê ku ew jî di vê derbarê da serê xwe

⁷ Di vê derbarê da – di nasîya 2. da.

⁸ Di nasîya 3. da, li r'ûpelên 10–11. binihêr'in.

li ser bêşînin, heye.

Lêbelê, divê bê gotin, her çiqas, Mînasyan têdigihîje, ku: "... *Pêwîst e, di derbarê dîrok, p'êwendiyên êt'nîkî, baweriyên olî, daxwez, kesayetî û nîgara gelên cînar da agahîyên r'astîn ... bidin gelê ermenî ...*" – bi xwe jî dem bi dem wan r'êgezan naşopîne, û ew jî di hemû weşanên wî da xwe dide xuyan.

... Belê, mixabin, di dîrokê da gelek caran wisa dibe, ne ku dîroka gelan a r'astîn, lê yeke dinê, ya hinartî û lêpovajîkirî didin wan (an *li stûyê wan dipêçin*, eger hûn bixwazin!), û ev jî hema dibe sedema nak'okî, gengeşî û p'evçûnan di navbera gelên cînar da. Û, eger di dema xwe da aghî û daneyên dîrokî neguhar'tibûna, dibe ku îro ne ewqas pirs derk'etana holê, ne jî, dê gengeşî, nak'okî û p'evçûn di navbera gelan da pêk bihatana.

Lêbelê, em nixandinên xwe bidomînin!

Ji bo ku baldarîya xwendevanan bê misogerkirin, bêhêvîtiya wan bê belavkirin, k'a, em careke dinê agahîyên wan ç'avkanîyan li ber ç'avan r'a derbaz bikin, ên ku lêger'înerê alman *Íohann Haynrîx Drîmêl* û nivîsk'arê ermenî *M. Mînasyan* di p'irtûkên xwe da anîbûne. Lêbelê, ji ber ku min li jorê, dema nixandinên nameyên xwendevanên min êdî t'êra xwe parç'eyên cuda ji p'irtûka *Mînasyan* anîbûn û nixandibûn, li vira ezê vege'irîm ser p'irtûka *Í. H. Drîmêl*.

Wek ku êdî berê jî hate gotin, *Drîmêl* dinivîse, ku hê berî bûyîna Îsa navê Araratê bi zimanê cihûdan ê T'emîya Kevn (The Old Testament) wek קרדו (Kardo. – E. C.) hatye nivîsîn, ku werger'a vê p'eyvê bi zimanê xaldêyî (keldanî) heye, û ew hêjayî her r'êzgirtinê ye, lewra ku ew wat'eya vê p'eyvê zelal û r'ast dide zanîn, ku gelên r'ojhilatî wê wek *kard, kord, kûrd* lêvdikin, lê yewnanî –wek *kord, gord*, û ji van jî ev navên hanê pêk hatine: *Kardû, Kordanîya, Kûrdam, Kûrdîstan, Kordakên, Kardûxên, Kordîlîa, Kordîêa*.⁹

Ev hemû p'eyvana jî, – ew didomîne, – heman xakê û heman gelî didin zanîn, ê ku hîç dagerkerêkî nikaribûye ji welatê wî yê kal û bavan – ji K'urdistanê derîne ...¹⁰

Û di encamê da *Drîmêl* gotina xwe weha li ser hev da tîne: "...*wek ku agahîyên min li jorê anîne, îzbat dikin, ku k'eştîya Nuh P'êxember li K'urdistanê r'awestyaye, ew wisa jî îzbat dikin, ku k'urd gelê yekem ê piştî Sêlava Cîhanî bûne...*"¹¹

Û agahîyên vî r'engî ji hêla gelek lêger'îneran va dihatin zanîn, ên ku bi awayekî bi dîroka kevnar va mijûl bûne. Di vê derbarê da hem jî Mînasyan bi xwe di destpêka p'irtûka xwe ya "Hevberatiya T'orosan" da dinivîse. Lêbelê, ji wir û pêva ew wan agahîyan wisa r'aber dike, ku xwendevan bêyî r'ayê xwe dixwaze pirsan bide wî, gotinên wî r'avebike, lê li hinek cîyan jî, heya li dijî dîtînen wî yên encamî derê.

Binihêr'in!

⁹ Di derbarê vê mijarê da agahîyên hêja di gotara lêger'înerê k'urd Xerzî Xerzan a "Net'ewnavê 'k'urd' û navê welatê wan di ç'avkanîyên dîrokî yên demên cuda da" – <https://dirokurd.blogspot.com/2018/04/netewnavê-kurd-u-nave-welate-wan-di.html?spref=fb>

¹⁰ Di gotara "Paradok'sa dîrokê – çawa agahîyên di derbarê sêlava cîhanî da berovajî kirine!" – https://www.academia.edu/121111925/PARADOKS_A_DÎROKÊ_ÇAWA_AGAHÎYÊN_DI_DERBARÊ_SÊLAVA_CÎHANÎ_DA_BEROVAJÎ_KIRINE ; https://www.amidakurd.net/ku/tekst/PARADOK_S_A_DÎROKÊ

¹¹ Bi hûrbîni di vê p'irtûkê da: *Юган Генрих Дримель, Опыт исторического доказательства о происхождении россиян от араратцев, как от первого народа после всемирного потопы, предложенный съ нѣмецкаво. Санктпетербургъ – 1785 г., стр.: 5 – 25 // Íohann Haynrîx Drîmêl, "Serpêhatîya danasînen dîrokî di wê derbarê da, ku r'ûsiyayî ji araratîyan pêk hatine, yên ku gelê yekem bûne pey Sêlava cîhanî r'a". Sankt-Pêtêrbûrg – s. 1785., r'û.: 5 – 25. (Pirtûk bi zimanê almanî sala 1744-an, di bajarê Nyûrnbergê da hatye weşandin). – <https://knigogid.ru/books/1855418-opyt-istoricheskago-dokazatelstva-o-proishozhdenii-rossian-ot-araratcev-kak-ot-pervago-naroda-posle-vsemirnago-potopa>, an: <https://kp.rusneb.ru/item/reader/iogana-genriha-drimelya-opyt-istoricheskago-dokazatelstva-o-proishozhdenii-rossian-ot-araratcov-kak-ot-pervago-naroda-posle-vsemirnago-potopa>*

“... *Ev herêma çîyayî, ya ku îro wek K’urdistan tê zanîn, dilê welatê me yê demekê bûye, ya ku navê xwe “Welatê Araratê” bûye* (bi ermenî: Աշխարհն Այրարատեան – bi p’eyvî: Cîhana Araratê). *Û ç’îyayê Cudî yê îroyîn “Çîyayê Ararat” bûye, û Keştîya Nuh jî, wek ku di Nivîsa Pîroz da tê gotin, li ser wî r’awestyaye. Piştî dewr û zemanan, ji ber sedema çûna ermenîyan a berbi bakûr va û k’ombûna wan li wir, wana ew nav danîne ser herêna Araratê ya îroyîn û Çîyayê Araratê”*.¹²

Û li vira jî hema pirsên heşmendî r’ûdidin: “Mabesta Mînasyan çi ye, dema dinivîse: “... *Ev herêma çîyayî, ya ku îro wek Kurdistan da tê zanîn*”? – Wê demê mirov çi bi wan ç’avkanîyên kevna bike, di nava wan da wisa jî yên ermenîyan, û hinekan ji wan jî Mînasyan bi xwe bîr tîne, û di wan da jî bi tîpên r’eş li ser kaxezê sipî hatibûye nivîsîn, ku ew herêma ç’îyayî wek *welatê kordan* (K’urdistan), Kordavts aşxarh (bi ermenî: *Կորդվաց աշխարհ – Cîhana kordan, Cîhana kordî*. – E.C.), li k’u xwedanîya Araratê hebûye û di wê da jî – çîyayê Araratê? ¹³ An, mirov çi bi wan agahîyên lêgerînerê alman ê sedsala XVIII bike, ên ku dibêjin, ku hê berî bûyîna Îsa navê Araratê bi zimanê cihûdan ê T’emîya Kevn (The Old Testament) wek קרדו (Kardo. – E. C.) hatye nivîsîn, ku werger’a vê p’eyvê bi zimanê xaldêyî (keldanî) heye, û ew hêjayî her r’êzgirtinê ye, lewra ku ew wat’eya vê p’eyvê zelal û r’ast dide zanîn? Ku gelên r’ojhilatî wê wek *kard, kord, kûrd* bilêvdikin, lê yewnanî –wek *kord, gord*, û ji van jî ev navên hanê pêk hatine: *Kardû, Kordanîya, Kûrdam, Kûrdistan, Kordakên, Kardûxên, Kordîlîa, Kordîêa*? Ku, ... ev hemû navana jî heman xakê û heman gelî didin zanîn, ê ku hîç dagerkerêkî nikaribûye ji welatê wî yê kal û bavan – ji K’urdistanê derîne? ¹⁴ – Û ji bilê van, mirov çi bi vî gelî bike, yê ku îro jî li ser xaka pêşîyên xwe dimîne û dijî, bîranîna wan pêşîyan dip’arêze û r’anaweste, ji bo mafê xwe yê mirovî û net’ewî bitêk’oşe? ...”

Her çi jî hebe, k’a, em bidomînin!

Û Mînasyan li ser vê notê agahîyên di derbarê hêjayîyên çê yên k’urdan da tîne, yên ku ewî ji ber p’irtûka Wilyam Worfield girtibûne, û piştî wê dicêr’ibîne, wan têk’ilîdarî ermenîyan jî bike, û hewl dide, bide p’ejirandin, xwedlgeravî, r’ehên hinek berekên (eşîr) k’urdan ên ermenîyan in...

Helbet, em hemû mirov in, û lewra jî r’ehên me hemûyan digihîjin hev, bi t’aybet jî, yên k’urd û ermenîyan, ên ku ev êdî 2500 sal e, bûne cînarên hev, lê cî-cîna heya di nav hev da jî dijîn. Û di r’ewşên weha da di navbera nûnerên wan da zewac jî pêk hatine. Û di vê derbarê da Mînasyan bi xwe jî dinivîse. Ev pêvajoyeke dîrokî ya xwezayî ye, mirov nikare wê r’awestîne.

Lewra jî, bi demê r’a gelên herêmê, her çiqas çûye, mînanî hev bûne: *k’urd, fariz, ermenî*, û heya *t’irk* jî. Û heya îro ji kesekî r’a li hev nehatye, ji wê pêvejoya xwezayî r’a bibe asteng (li k’u jî hebe, hemû mirov in!), û çiqasî jî hewl bidin, encamên van pêvajoyan berbi hinek armancên xiyalî (ûtopîk) va bik’îşînin jî, yek e, meşa xwezayî ya pêvajoyên dîrokî û encamên wan a xwe hiltînin...

Lêbelê, eger mirov evê pirsê hema di vê çarç’oveyê da binirxîne, agahîyên dîrokî yên pêbawer di wê derbarê da hene, k’a ji k’u di nava van gelên cînar da ewqas tiştên hevbeş p’eyda bûne.

Ç’avkanîyên kevna û yên sedsalên navîn hene, ên ku bi bingehê va hemû lêpovajîkirinên dîroka gelê k’urd derew derdixin û r’ed dikin. Di nava wan da, bi t’aybet jî, ç’avkanîyên ermenîyan cuda dibin.

Çima, hema ç’avkanîyên ermenîyan? – Lewra ku, her çiqas, di wê herêmê da, mirov

¹² *U. Ufhusutwul*, «Տարրոտեան եղբայրակցութիւնը». Ֆրեզնո – 1923 թ., էջ 3 – 4. // *M. Mînasyan*, “Hevbiratîya T’orosan”. Frêzno – s. 1923. r’û. 3 – 4.

¹³ Di nasîya 6. da binihêr’in.

¹⁴ Bi hûrbînî di masîya 7. da binihêr’in.

ji çi hêlê va jî li pirsê bunihêr'e, hemû gel cênarên hev in, lêbelê, têk'ilyên k'urd û ermenîyan t'aybet bûne. Heya sedsala VI a berî bûyîna Îsa (b.b. Î) ermenî li Fr'îgîyayê jîyane. Lê bi dîrokî wisa pêk hatye, ku ewana neç'ar mane, cîh û warên xwe bt'erikînin. Û, li ser r'êyan, ku ji xwe r'a cîyekî bibînin û lê sit'ar bibin, ewana tèn-digihîjin ber sînorên Împêratorîya Medyayê, berbir'î r'êvebirîya dewleta gewre dibin, bi wê hêvîyê, ku wan sit'ar bikin. Û Kîak'sar (Ûvaxşatra//Vîştaspa), împêratorê Medyayê, bi hinek mercan beşê Kafkasîyayê yê Ûrartûyê, ya ku wî bi xwe berî demekê dager kiribû û gîhandibû dewleta xwe ya gewre, dide wan, ji bo ku ew têda st'ar û bi cîh û war bibin. Paşê r'êvebirîya Medyayê bir'yar dike, Parûyr ê r'êberê p'enaberên ermenî, t'acîdar bike, û ji bo wan dewletê dadimezirîne. Û ji wir û pêva dewleta ermenîyan a nûdamezirandî di bin baskê Împêratorîya Medyayê da û di goveka bandora çanda wê da pêşdik'eve.¹⁵

Di derbarê bandora çandî ya Medyayê li ser ermenîyan da agahîyên balk'êş li bal Strabon, erdnîgarzan û dîroknûsê yewnanî yê kevnar, hene. Ewî nivîsyê: "... *Ên med, wek ku dibêjin, bapîrên kevnepîyên ermenîyan û hê berî van jî yên p'ersan, serok û peyhatîyên wan in...*"¹⁶ – Hemma, divê li vira bê gotin, ku Strabon p'eyva "kevnepî" di vê kontêk'stê da bi wat'eya *çandê* ya fireh va daye k'aranîn.

... Pêşîyên ermenîyên vê dema me, wek gel, di nava hewayaya çanda medî da pêşk'etine, ji wana zerdestî p'ejirandine.

Weha, medan di dîroka gelê ermenî da r'oleke weha ya çarenûsî listîne!

Û lewra jî, di ç'avkanîyên ermenîyan da, wek ku di derbarê *medan* da, wisa jî di derbarê k'urdan, wek peyhatîyên wan ên r'astedêr da û di derbarê gelek tiştên dinê da agahîyên balk'êş hatine p'arastin. Nivîsk'ar û dîroknûsên ermenî, dema di derbarê kurd-medan da nivîsîne, ewana ew agahî ji ç'avkanîyên hineke dinê negirtine. Ewana di wê derbarê da dinivîsin, ya ku bi xwe li ber ç'avên xwe dîtine, an jî ç'avdêrên wan bûyeran bûne.

Ji bo ermenîyan k'urd ne ku t'enê peyhatîyên r'astedêr ên medan in, lê heya sedsala XVI k'urd û med ji bo ermenîyan yek gel bûne, dema ermenîyan gotine: "*k'urd*", mabesta wana *med* bûne, û, berovajî wê, dema gotine: "*med*", mabesta wana *k'urd* bûne.

Di vê derbarê da delîlên nivîskî yên pêbawer di ç'avkanîyên ermenîyan ên sedsa lên navîn da hatine p'arastin.

Weha, her t'enê çendek ji wana: "... *Berbangê zû yên med hatin, ên ku ji wan r'a k'urd dibêjin*". – *Ev bûyer, a ku di derbarê wê da li vir tê gotin, ango hatina k'urd-medan a ber dêra ermenîyan a T'spnê, 19-ê gulana 1426-an pêk hatye.*¹⁷

"... *Binecîyên wî welatî, yên ku k'urd in, ji wan r'a med dibêjin*". – Ji destnivîsara sedsala XVI.¹⁸

Agahîyên balk'êş wisa jî li bal r'onaydarê ermenî yê mezin ê sedsala XIX Xaçatûr Abovyan hene. Bala xwe bidinê, ewî di têtînîyên berhema xwe ya "Ên k'urd" da çi nivîsyê: "*Çamçyan di p'irtûka xwe ya "Dîroka Ermenîyan" da (berga I, serîyê 10, r'û.*

¹⁵ Минорский В. Ф., Курды. Заметки и впечатления, Петроград, 1915 г., стр. 6 – 7 // *Mînorskîy V. F.*, "Yên k'urd. Têtînî û bîranîn", Pêtrograd, 1915, r'û: 6 – 7.; *Ekrem Cemîl Paşa*, Dîroka Kurdistan bi kurtebirî. Bruksel, 1995, r'û: 231 – 234; *Uñlûtu turtênuugh*, *Ջայնց պատմություն, Երևան*, 1991, էջ 123–131 // *Movsês Xorênatsî*, "Dîroka Ermenîstanê", Yêrêvan, 1981, r'û. 123–131; *Геродот*, История, I, стр. 108 // *Hêrodotos*, "Dîrok", I, r'û. 108; *Սիոն Վարդապետ Տէր-Մանուէլեան*, «Եզրի կուրման», Ախալցխա, 1910, էջ 3 – 4 // *Sîon Vardapêt Têr-Manvêlyan*, "Kurmancên yêzîdî", Axaltsxa, 1910, r'û. 3 – 4.

¹⁶ *Страбон*, География, XI книга, Москва, 1964, стр. 495. // *Strabon*, Erdnîgarî, pirtûka XI, bi r'ûsî, Moskova, 1964, r'û. 495.

¹⁷ *Արիստակես Տէր-Մանուէլեան*. *Ջայերգ*, – Թիֆլիս, 1882, էջ 175 – 180. // *Arîstakês Têvkants*, "Hayêrg", T'îflîs, 1882, r'û: 175 – 180.

¹⁸ *Ջայաստանի Մատենադարան*. XVI դարի ձեռագիր № 1495, էջ.էջ. 142ա և 142բ. // *Matênadarana Ermenîstanê-Înstîtûta destnivîsên kevnar, desmnivîsa dewra XVI, №1495, r'û. 142a û 142b.*

100) li dû hev navên hemû nûnerên (walî. – E. C.) medan anegorî dîroknûsên yewnanî, yên wek Hérodotos, Dîodoros, Alîkar û yên dinê, ji Arbûkês heya Diyokês r'êz dike, dibêje, ku yên med (ango, k'urdên kevnar) li dora t'or'inên xwe lap ji hev cuda jîyane... ”¹⁹

Bala xwe bidinê, li vira têgihîştineke balk'êş dertê pêş mirov, ne wisa: “... ên med, ango k'urdên kevnar”. Bi gotinek a dinê, ji bo wî ên med k'urdên kevnar bûne!

Û agahîyên weha di berhemên dîroknûsên ermenî yên demên bêhtir nêzîkî me–yên destpêka Sedsala XX da jî hene.

Weha, t'enê çend têbînî ji p'irtûka “Kurmancên yêzîdî” ya ezdazanê ermenî yê destpêka sedsala XX *Sîon Vardapêt Têr-Manvêlyan* : “*êzdîyên kurmanc – peyhatîyên medan*”, “*êzdîyên îro – peyhatîyên Astîagê p'ir'hespî*”, “*peyhatîyên Êkbatanê – dewleta demekê ya gewre, êzdîyên kurmanc*”, “*cînarên me yên îro yên xêrxwaz kurmancên êzdî ... şaxekî medên bi hêz û zor, peyhatîyên Astîagê ji binemala Vîştaspa ne*”.²⁰

Lêbelê, di t'evahîya van agahîyan da, ya ku herî zêde hêjayî baldarîyê ye, ew e, ku, her çiqas, p'ers (fariz) bi r'êya derbeya hindur'în a qesrê di Medyayê da bûne hevp'arên desthilatdariyê, û paşê li ser bingeha wê dewleta xwe ava kirine, bûne mîrat'girên Împêratorîya Medyayê, lê ermenîyên cînar, her çiqas ew wê demê vassalên farizan jî bûne, t'u carê ew û med yek nedîtine, heya ew mînanî hev jî nekirine. Lê yên k'urd û med ji bo ermenîyan bi dîrokî hert'im jî yek net'ew bûne.²¹ Û ev di derbarê gelek tiştan da dibêje!

Lê, ji bilî van hemû ç'avkanîyan, îro di K'urdistanê da gelek p'eykerên dîrokî hatine p'arastin, wek govenîya r'aborîya şaristanîya bi nav û deng a demekê ya Medyayê, û di nava wan da du bajarên bêhemp'a û nebînayî: *Amed* (ji p'eyva k'urdî ya *a med*, ango, *a medan*, ango, ya ku bi xwe *med e!*) û *Amedî* (ji p'eyva k'urdî ya *a medî*, ango, a ku *ya medî ye!*), wek sembolên zêndî yên nav û dengê şaristanîya medî ya kevnar...

Ev – wek agahî, ya ku hêja ye, **mirov li ser baş bide heşê xwe, bi hûrbînî wê binirxîne, dahûrîne û tê bigihîje, k'a r'astî di çi da ye.**

Lêbelê, berî wê, ku derbazî nirxandina pîrsa ermenîyên Mûşê, Sasûnê, Wanê û herêmên dinê yên K'urdistanê bibim, bibêjim, ku, bê guman, di van û herêmên dinê yên K'urdistanê da ermenî jîyane... Piştî wê, ku r'êvebirîya Medyayê beşê kafkasîyayê yê Ûrartûyê daye ermenîyên p'enaber, û ew li wira êwirîne û bûne mal-avahî, û paşê r'êberê wan Parûyr t'acîdar kirine, û ji bo wan dewlet damezirandine, ermenî li cîyekî r'ûnenîştine, ewana li dû mercên baştir, derbazî bajar û herêmên dinê yên Medyayê bûne, û wis jî çûne Wanê (Tûşpayê). Ew di encama lêger'înên ji bo p'eydakirina k'ar û bazarên nû bûye, ji bo bazirganîyê. Pêvajoyên vî r'engî wisa jî demên dinê û di herêmên dinê da jî pêkhatine. Mînak, di sedsalên navîn da ermenî bi heman şeweyî derbazî bajarên Bek'û û Tîflîsê jî bûne, û di destpêka sala 1920-î awana êdî p'ir'anîya nişteciyên wan bajaran bûne. ... Û, eger nak'okî û tevlihevîyên dîrokî nînbûna, yên ku di destpêka sedsala XX di Kafkasîyayê da pêk dihatin, ew bajarana ji hêla jimara nişteciyên xwe va dikaribûn bibûna yên ermenîyan...²²

Em veger'in ser p'irtûka Mînasyan û binihêr'in, k'a ew gav bi gav çawa r'amanên

¹⁹ *Արմյանսու* Կրկերի լիակատար ժողովածու, ութ հատորով, ութերորդ հատոր. – Երևան, 1958, էջ 284 // *Abovayan X.* Berevoka berhemana a t'am, bi heyst bergan, berga heştem. – Yêrêvan, s. 1958, r'û. 284.

²⁰ *Տղ-Սառնէլեան Ա. Վ.* Եզդիի կուրման, Ախալցխա, 1910 թ. – էջ 3–6 և 41. // *Sîon Vardapêt Têr-Manvêlyan*, “Kurmancên yêzîdî”, Axalt'sxa, 1910, r'û. 3 – 4 û 41.

²¹ Di vê derbarê da wisa jî di hevp'eyvîna dr. Îsmet Konak da ya bi Ezîz ê Cewo r'a: “Zerdeştî û ên med” – https://amidakurd.net/ku/nuce/ZERDEŞTÎ_Û_ÊN_MED_HEVPEYVÎN û https://www.academia.edu/87917739/Zerdeştî_û_ên_Med_hevpeyvîn; û di gotarên Ezîz ê Cewo yên: “Dîlêma dîrokî yan îdêa fik's?” – <https://www.amidakurd.net/pel/DÎLÊMA-DÎROKÎ-YAN-ÎDÊA-FÎKS-1.pdf> û “Lê k'a, êdî rastî li k'u ma?” https://amidakurd.net/ku/tekst/lê_k_a_êdî_r_astî_li_k_u_ma da.

²² Di derbarê vê mijarê da wisa jî dikarin di gotra Ezîz ê Cewo ya “Lê k'a, êdî rastî li k'u ma?” da bixwînin – https://amidakurd.net/ku/tekst/lê_k_a_êdî_r_astî_li_k_u_ma

xwe ji vê hêlê va pêşdixe.

Û ji bo wê ew careke dinê berbirî agahîyên Worfeld dibe, yê ku (bi gotinên wî) sala 1913-an ger'ek a zanistî (êk'spêdît'sîon) ji Kendava farizan heya Derya R'eş pêk anîbûye, û r'êya wî ji navçeyên navendî yê K'urdistanê r'a û ji Baxêşê, Wanê, Ûrmîyê, Atrpatênê û Tewrêzê (Tebrîz) r'a daerbaz bûye, heya çûye-derk'eteye Cûlfayê. Ew di derbarê k'urdan da agahên balk'êş ji p'irtûka wî tine: "... *di nava wan da*, – ew gotinên ji pirtûka Worfeld tine, – *yên here berbiç'av nûnerên k'urdên bakûrî ne, yê ji berekên (eşîr) Hekkarîyê: ewana xwedî bedeneke xurt in (bi dest û p'ê ne), bejnbilind û bejnzirav in, xwedî t'imt'êleke xweş in, r'onî ji ç'avên wan hiltê, ew jîndar in, serbest t'evdigerin û gelek caran xweşîyan jî (laqirdîyan) dikin. Cudahîya di navbera wan û ereban da li ber ç'avan e... Cil û libasên wan p'ir' bedew û xweşik in...* – Û piştî ku dinivîse, k'a Worfeld di derbarê cil û bergên k'urdî da çawa bi xweşikî dinitînê, yê ku ji wan, ermenîyan, ra êdî nas in, Mînasyan didomîne: – *Ewana k'olozên kulavî yê tenik didin serê xwe, yê ku bi gelemperî bi şewazê qubeyî ne, û bi k'efiyên r'engîn pêçayî ne. Wergirtina cil û libasan a wî r'engî bejn û bala mirovên ji Hekkarîyê bêhtir bi xweşikî dide xuyan û wana zeel wek nijadek a ... ji ereban cuda dide xuyan*". – Û li vira ew diqîre: – *Çi mînahevyeke nêzik di navbera bejn û bala binecîyên K'urdistanê Bakûr û nişteciyên Wanê û Mûşê da heye, yê ku nêzikî wan dijîn!...*

*Ev mînaheviya bejn û bal û jîyana binecîyên herêma çiyayî ya T'orosan û ermenîyên cînarên wan ên Sasûnê, Mûşê û Wanê encama hemanîbûna nijadî ye..., – Mînasyan dibêje û dîtina xwe dibe sêrî: – *Bi r'astî, hevbiratîya T'orosan her t'enê yekîtîyeke erdnîgarî nîne, ew wisa jî semboleke t'aybet a yekîtîya daxwazî û îdealên pêşer'ojê ye, sembola yekîtîya t'aybetî û nîgarên cuda û ya r'amanên net'ewî û çandî ye...**

Û piştî vê jî ew dîtina xwe di derbarê têk'ilîyên nijadî yê di navbera ermenîyan û k'urdan da weha pêşva dibe: "*Wek ku em îro dikarin di nava berekên (eşîr) k'urdan da şewazên here nêzik ên pêşîyên me armênên binecî (bi ermenî: *արմենական* – *armênoid*. – E. C.) bibînin, wisa jî dikarin di nava k'urdên k'oçer, an berekên cuda yê ji derdoran qutbûyî (îzolebûyî) û t'enê mayî da şewazê herî paqij û xwezayî yê arîyên pêşîyên me yê hatî bibînin...* – Û piştî ku agahîyên ji ç'avkanîyên cuda tine, Mînasyan didomîne: – *Û ev agahîyên antrpologî, yê ku pêkhatina binecîyên herêma çiyayî ya T'orosan didin xuyan, bala me berbi bûyera dîrokî va – berbi pêkhatina hevbiratîya T'orosan va dik'işênim, ya ku ji bo ermenîyan ne ku t'enê ji hêla bîranîna r'ojên bihurî va p'ir' girîng e, lê wisa jî, bi t'aybet, wek mrcekî domdar, ji bo mîaserkirina hêvîyên me yê net'ewî yê sedê salan di r'ojên pêş me da...*"²³

Li vira, berî wê, ku nirxandinên xwe bidomînim, ezê têbînîyeke ne zêde mezin bînim, ya ku, dibe ku bi şewazî (formal) têk'ilîya xwe ya r'astedêr bi pîrsgirêkê r'a ninbe jî, lê, ji bo r'asttêgihîştina têgîna "*armênoid*" (li bal Mînasyan: *արմենական* – *armênî*), p'ir' girîng e. Lewra ku, wek ku tê xuyan, ewî bi r'astî bawer kirye, ku ev têrmîna r'asayekê (nijad) dide zanîn, a ku di bingeha xwe da hema *êt'notîpa ermenî* heye.

Lêbelê, divê bê zanîn, ku ev têrmîna îro têgîneke kevnûbûyî dide zanîn, a ku di bingeha wê da t'u delîlên zanistî nînin. Ev, wek ku hemû têrmînen dinê yê vî warî, p'ir' mercî ne. Cara yekem antropologê aûstrî *Fêlik's fon Lûşan* (û Mînasyan jî dem bi dem ji wî mînakan tine) û *Yêvgynî Pêtêrson* sala 1889-an di p'irtûka xwe ya «Reisen in Lykien, Milyas und Kibyrtis» // "*R'êwîtiya li Lîkiyê, Milyasê û Kîbîratîsê*" da daye k'aran.

Paşê, hê dereng, antropologê amêrikî *Karlon Kûn* (1904 – 1981) herêmên Asîa R'ojava, yê wek Anatolîya, Kafkasîya, Îraq, Îran û Lêvant, wek navenda belavbûna r'asa *armênoid* dide nasîn. Lê bi dîtina antropolog C. Grints (1926 – 2006), asorî, babilî, wisa jî hinek êgyûptîyên (misirî) kevnar (bi t'aybet, yê ji Sînayê û Felestîne) *armênoid* bûne.

Wisa jî tê gotin, ku r'asaya *armênoid* şaxekî modêla dabeşandina mirovahîyê li ser nijadan e, ya ku di serê ser da ji bo piştgirîya siyaseta mêtîngerîyê ji hêla ewropîyan va hatibûye hinartin, û, ku kontsêpta r'ojavayî ya r'asayan divê wek sîstêma dabeşandinê bê

²³ Di nasîya 12. da, r'û.7 – 10.

têgihîştin, a ku di encama pêkhatina sîstêma mêtîngerîya Ewropayê ya zext û zordarîyê derk'etye holê, ji bo piştgirîya wê siyasetê bike.

Lê ji bo mirov heya dawîyê têbigihîje, divê wisa jî bê zanîn, ku r'asa armênoîd wisa jî wek k'oma *assîroîd* an a *pêşasîyayî* tê zanîn, û xwedîya van t'aybetmendîyan e:

r'engê ç'erm – tarî;

r'engê ç'avan – r'eş an t'êk'el;

pirç'a li ser bedenê – p'ir' pirç'în e (ev yek ji girîngtrîn nîşanên r'asayî ye, ya ku dema lêger'înên antropologî bi gelemperî t'enê ji bo mêran tê dyarkirin – cuda li ser r'û û bedenê);

bejn – nîvçe;

şewazê sêrî – braxîkefalî (şewazê serê mirov ê qut û fireh, ê nêzîkî gulover'îyê);

firehîya dêm – t'êra xwe fireh e;

şewazê poz//bêvilê – bel.²⁴

Helbet, ev hemû dabeşînên nijadî (rasayî) û t'êrmînên wan, ji hêla hûmanîstîyê va, p'ir' mercî ne, lewra jî em kontsêpta dabeşkirina nijadî ya mirovahîyê ji zanîstê û zanîyaran r'a bihêlin û nirxanîyên xwe bidomînin ...

Li cîyekî dine Mînasyan dinivîse, ku yên k'urd di Hevberatiya T'orosan da xwedî sekin û r'ewşeke girîng in..., lê ji hêla siyasî va ewana miftiya damezirandina dewleta serbixwe ya Torosan in.

Ew bi bawer bûye, ku di derbarê hindewropîbûn an arîbûna r'ehên k'urdan da du nêr'în nikarin hebin. Bi gotina wî, prof. Lûşan k'urdan peyhatîyên mîtanîyan dihejmêre, yên ku sala 1500-î ya b.b.Î. dewleteke gewre damezirandine...

Piştî vê ew t'omar dike, ku gelê binecî yê herêma ç'îyayî ya T'orosan di dîroka kevnar a R'ojhilata navîn da r'oleke girîng listye. Ku di k'ûrahîya dîroka kevnar da, dema hê dewletên xê'tan û ûrartîyan nînbûne, dema di p'aşla pêşer'oja nedyar da Asoristan hê di xewê da bûye, dema Îbrahîm hê ji dêya xwe nebûye û pêkhatina cihûdan her derfetek a dûre derez bûye, û, dema berekên (eşîr) dijhev ên sûmeran û samîyan di Navç'emkê (Mêzopotamya) da şer'ê man û nemanê meşandine, di wê serdema bi mij û dûman a dîrokî da p'adişahên wê demê yên K'urdistanê t'evgerên leşkerî berbi Babilê va pêk anîne, li k'u wana derdorê 125 salan r'êvebirîya t'evahîya Navç'emkê (Mêzopotamya) pêk anîbûn. Wê demê navê p'adişah-cîhanp'enahekî Kûtîûmê yan Kutîyê Tîrîgan bûye. Hema ji vî navî jî, bê guman, navê ermenî yê Tîgran pêk hatye.

Bi r'astî, dê p'ir' bi feyde be, – ew didomîne, – ku mirov dîmenê bûyerên here gewre yên bilindç'îyayên T'orosan r'onî bike, û bide xuyan, k'a çawa ç'arenûsa gelê ermenî hert'im bi ç'arenûsa pêşîyên k'urdên îro va hatibûye hevûnan.

Li ser bingeha r'onîkirina t'aybetîyên êt'nîkî yên k'urdan – Mînasyan gotina xwe didomîne, – em gihîştin wê encamê, ku pêşîyên wana berekên arî yên hatî bûne, paşê ew û armênoîdên binecî t'evî ev bûne. Ev pêvajoyana tevîhevbûnê di demên p'ir' kevn da destpê bûne...²⁵

... Hebûna k'urdên ç'avhêşîn, zerîn, bejn bilind û bejnzirav di herêma ç'îyayî ya T'orosan da ji hêla antropologî va pirsên p'ir' girîng derdixin pêşîya me. – Ew bîr û boçênên xwe didomîne. – k'urd peyhatîyên r'astedêr ên pêşîyên arî yên ç'avhêşîn û zerîn in. Di vê derbarê da hîç gumanek jî nikare hebe.

Di nava xwîna hevberayên me yên k'urd da, r'asttir, di nava gênên wan da t'aybetîyên bijarte yên berehdarîyê û jêhatîbûnê yên gênêtîkî û xwezayî hatine p'arastin...

... Di bingeha êt'nîkî ya hemwelatîyên me yên k'urd da gelek derfet'ên bêhemp'a hatine danîn, ên ku... dê navê Cîhana T'orosan r'ûmetdar û nemir bikin...

²⁴ См.: https://en.wikipedia.org/wiki/Armenoid_race и https://ru.wikipedia.org/wiki/Арменонидный_тип

²⁵ Di nasîya 12. da binihêr'in, r'û. 12 – 17.

Û peyr'a, piştî wê, ku di wê derbarê da mînakan tîne, k'a nijada (r'asa) hindewropî (arîyî) çawa derk'eteye ser sehna dîrokê, Mînasyan gotina xwe weha t'omar dike: "...û, eger heman peyhatîyên hindewropîyên p'or'zerîn, piştî ku meşeke leşkerî berbi Ermenîstanê va pêk anîn, û di encamê da t'orînîya (arîstokratî) net'ewî ya ermenîyan şêwazdar kirin, û di dîroka ermenîyan da bûn ç'avkanîya r'izgarîxwazîyê û t'evgerên bi r'ûmet, mirov çima nebêje, hêvî neke û bi fedek'arî hewl nede, ji bo ku nûnerên hemdemî yên here paqij, r'ast û mafdar ên arîyan, hevbirayên me yên k'urd jî, di dîroka herêma ç'iyayî ya T'orosan da heman erk'ê pêk bînin? ... " ²⁶

Belê, "Hevbiratîya Torosan" a M. Mînasyan p'irtûkek a weha ya balk'êş e, ya ku di wê da li r'ex nêr'înên wî yên cuda, yên ku carna heya bi nak'okî ne, agahîyên dîrokî bi aştî dihênijîn, yên ku di r'astîya xwe da di derbarê tiştêkî dinê da govenîyê didin...

Û ev hemû ewî bi baldarî bervkirine û bi hêvişdarî di p'irtûka xwe da t'omar kirye, û, wek ku li jorê hate gotin, êdî ewqasî jî ne girîng e, k'a dîtînen wî di wê derbarê da çî ne, ma ne, dahûrandînen (analîz) hemberhevkirinî û r'exneyî hê ji hêla kesekî va nehatine betalkirin... Wisa ku, bila xwendevan jî di derbarê nêr'în û dîtînen nivîsk'ar da carna matmayîna xwe dyar bikin, lê, bi wê r'a wisa jî, dê li ber wana agahîyên dîrokî yên p'ir' balk'êş vebin. Ma ne, xudanê p'irtûkê matêrîalên bêhemp'a ji ç'avkanîyên demên cuda tîne. Û heya carna wisa dibe, ku di bin bandora wan agahîyan da ew digihêje hinek encaman, ên ku, eger birovan nerm jî bibêje, di nava dîtîna wî ya gelemperî (kont'sêpt) da cîh nabin ... Lewra jî, di nava nêr'în û dîtînen wî da gelek caran cudaxwendin û nak'okî dertên holê, yên ku xwendevanan şaş û tima dihêlin.

Ê, çî, bila hema wisa be! Ma ne, wek ku Sokratês gotye: "R'astî di gengeşîyan da hasil dibe!"

Lê ya here sereke, bi hemû nêr'înên xwe yên bi nak'ok û dijhev va jî, Mînasyan ji bo dema xwe, wek ku karibûye, hewl daye pêkhatina gelan, t'aybetî û hêjayîyên wan ên mirovî û p'êwendîyên di navbera wan da têbigihêje, lê her carê jî, ewî jîbîrnekirye, di wê derbarê da nêr'îna xwe ya cuda bîne zimên, bi t'aybet jî, di pîrsa r'ola nijada (r'asa) *armênoid* di şêwazgirtina net'ewa k'urd (êtnogênêz) da. Û ev bi serê xwe dê nebûya sedema r'ûdana hinek pîrsan, eger xudanê p'irtûkê hema-hema di her k'urdekî da êtnotîpa (bineşêwaza êt'nîkî) ermenîyan neger'îya û "nedîta", her çiqas, dema ew agahîyên ç'avkanîyên dinê dinirxîne, her tiştî berovajî vê r'avedike. Di vê derbarê da, dema li ser teorîya dabeşandîna r'asayî ya gelan diaxivîm, min êdî gotye, agahîyên berdest anîne, wisa jî bi kurtahî di wê derbarê da dîtîna xwe anye zimên.

Lêbelê, hê dereng ev îdêaya bê serûber li bal hinek nivîsk'aran bi r'ûdanên nebînayî derk'et pêş. Û li ser vê notê heya têgîna "ermenîyên k'urdîaxêv" (bi ermenî: *քրդախոս հայեր/krđaxos hayêr*) hinartin. Û ya here matmayîne ew e, ku wê demê kesekî nepîrsî û îro jî napirse: "Eger ew mirovîna bi k'urdî diaxivîn, bi k'urdî dijên, bi k'urdî şad û dîlkovan dibin (ango, şîn û şahîyên xwe bi k'urdî pêk tînin), ew çawa dikarin ermenî bin?"

Hê sala 1984-an di Yêrêvanê da bi zimanê ermenî berevoka "T'alîn" hatibû weşandin, û di wê da stran û awazên gelêrî yên ermenîyên navçeya T'alînê ya Ermenîstana Sovêtî hatibûn t'omarkirin. Di vê berevokê da beşê "Stranên şînê" («Ողբերգ») jî hebû. Û di wî beşî da t'enê stranek hebû, ya ku berevk'ara zargotina gelêrî ji ber zarê Xanûm Gabrîelyanê girtibûye û nivîsibûye. Û li vira ya here balk'êş ew e, ku ewê ev stran li ber darebesta birayê xwe yê bihuştîbûyî bi k'udî lûvandye, ango şîna birayê xwe bi k'urdî pêkanye, û di derbarê wê da jî berevk'arê di nasîya jêrîn da bi xwe nivîsye. Weha, ew nivîs: "Strana şînê bi k'urdî pêk tê: Xanûm Gabrîelyanê piştî lûvandîne ew bê amadek'arî wergerandye (nasî ya berevk'arê ye)". ²⁷

Ma, ev tiştêkî ecêb û nebînayî nayê xuyan?

²⁶ Di heman cîhî da. R'û. 123 – 126.

²⁷ «Թալին: Հայկական ժողովրդական երգեր և նվազներ»: Երևան –1984 թ., էջ 76 // "T'alîn. Stran û awazên gelêrî yên ermenîyan". Yêrêvan – s.1984, r'û. 76.

Divê li xwe mukur' bême, wê demê di serê min da jî hinek pirsan r'û dan, lê wê demê min nikaribû bersîvekê ji bo wan bibînim: "Çawa dikare bibe, ku nûnerêka gelekî şîna birayê xwe bi zimanê gelekî dinê pêk bîne?! Ma ne kevneşopîyên net'ewî p'ir' kevneşopîyên in, ewana hema-hema li ser asta gêni tîn p'arastin!?"

Helbet, pirs hr'êtorîk (rhetorical) bû, lêbelê, wê demê ji min r'a li hev nehat, bersîvekê ji bo wê şewazdar bikim, an jî, dibe ku, ez wê ji hêla piştheşî va têdigihîştim, lêbelê, min nikaribû biyanî zimên. Dibe ku, hingê ew bergirîyek a hundur'în bû (an jî – *tirs*, eger hûn bixwazin!), an jî ew diyardeya xemsariya min bû? – Naha ew êdî ne ewqasî girîng e!

Wan deman, gava ku hevdîtînen cuda li vir û wir pêk dihatin, di wê derbarê da diaxivîn, hinekan digotin, ku di r'astîya xwe da, p'ir'anîya wan, ên ku wek ermenîyên Sasûn û Mûşê dihatin navkirin, k'urdên xaçparêz in, û dema veşer'a ermenîyên derva ew jî bi wan r'a anîne Ermenîstanê Sovêtê. Wî çaxî, serdema sovêtî, kême kesan guh didan axavtînen wî r'engî, her çiqas, di destpêkê da bi xwe ermenîyên binecî ew *k'urd* nav dikirin (carna jî heya bi qerf û t'ir'ane) ...

Û dihat gotin, ku berî ku r'ayê xwe ji bo çûyîna Ermenîstanê bidin, ewana her t'enê mercek li pêş nûnerên Ermenîstanê danîne: an divê wan di gundên k'urdan da, an jî di gundên cînarên wan da cîh bikin.

Helbet, di Ermenîstanê da vebijêrka (variant) duyem a mercê wan pêk anîbûn...

Dema tîn Ermenîstanê, ew p'êwendîyan bi k'urdên binecî r'a datînin, r'adîoyên xwe didin ser p'êla weşanên k'urdî yên R'adîoya Yêrêvanê, xwe ji bo r'ojnemeya "Rya teze" abone dikin, dema şahîyan sazband û dengbêjên k'urd vedixwînin, şîna mirîyên xwe bi k'urdî pêk tînin, ango, şadî û dilkovanîya xwe bi zimanê k'urdî û anegorî kevneşopîyên k'urdî pêk tanîn û h.w.d. K'urdên navçeya T'alîne, yên ku serlêdana gundên wan kiribûn, bi matmayî vedigotin, ku heya zarokên wan jî bi k'urdî digirîn û dik'enin, ku, dema di k'ûçe û kolanan da dilîstin, bi zimanê k'urdî gengeşî dikirin û zar digirtin hev...

Û ev p'arçeyên agahîyan wê demê sal bi sal berevî ser hev bibûn û ji bo ku gelek pirs r'û bidin, bingehek saz kiribûn. Lêbelê, her çiqas, her mirovek, ê ku hema piç'ekî serederîyê pirsên net'ewî û êtnîkî dikir, têdigihîşt, k'a pirs di çî da ye, lê têgihîştina xwe ya wan hemûyan nikaribûn şewazdar bikin. Lewra jî ew pirs hema wisa bi serê xwe hat hiştin, her çiqas, dem bi dem, dema hevdîtînen bi k'urdên navçeya T'alîne r'a, di derbarê ewên warguhêzî da bîr tanîn, û her carê weha matmayî dipirsîn: "*Hûn dibihên? Çawa ji we r'a bibêjim, ew jî hema wek me bûn, ya wan jî her tişt bi k'urdî bû: hem ziman, hem danûstandin, hem kevneşopî, şîna û şahî, û heya k'en û girîyên zar'okan! Lê van demên dawîyê, tuyê bibêjî, tiştêk ne wisan e! Çi pêk tê? Mirov tê nagihîje!*"...

Axivîn, axivîn, paşê hêdî-hêdî her tişt temirî.

Di mercên wê demê da, dema heya nivşên nû yên k'urdan, ên ku di gundên ermenîyan da diman û xwendina wan bi ermenî bû, bi berekêva întêgreyî civaka ermenîyan dibûn, êdî nivşên ewên warguhêzîbûyî li k'u man!

Paşê, bi demê r'a, gotebêjên di derbarê wan da bi berekê va, her çiqas çû, kême bûn...

Sal bihurîn, piştî jevberdana Yekîtiya Sovêtê gelek niştecîyên k'omarên Sovêtê yên berê berê xwe dan R'ûsîyayê. K'urd û ermenîyan li vira jî p'êwendî û têkilîyên xwe yên dostanîyê domandin. Carna hinek agahî di wê derbarê da dihatin, ku hinek peyhatîyê wan warguhêzîyên navçeya T'alîne ya Ermenîstanê Sovêtî li R'ûsîyayê bi k'urdên Bakûrê Kurdistanê r'a nas bûne, bi wan r'a bi zimanê k'urdî axivîne, di navbera wan da têgihîştînek gihîştîye, bi hev r'a k'arên hevbeş danîne û hevaltî kirine...

Carekê, nîveka salê nodî bû, min bi ciwanekî k'urd ê ji T'bilîsîyê r'a sowbet dikir, û ewî ji min r'a got, ku ew li vira, li Moskovayê, bi ermenîkî navçeya T'alîne ya Ermenîstanê r'a nas bûye. Ku paşê, dema di navbera wan da têk'iliyên dostane pêk hatine, ew li xwe mukur' hatye, ku pêşîyên wî ji Sasûnê bûne, ku ew k'urd bûne, û nivşên kevn serbest bi k'urdî axivîne û îro jî diaxivin, lê nivşên nû – ne ewqasî...

Çi jî bûbe-nebûbe, îro di navbera herdu gelan da tiştê ku ew li ser biaxivin heye, her t'enê dimîne, ku dîrokzan û siasetmeder, wek ku tê xwestin, k'ar bikin, ji bo ku dîroka gelan a r'astîn, ne ku ya lêpovajîkirî, bigihînin wan. Û di wê dîrokê da jî, r'ûpelên wisa hene, ku her mirovek dikaribû bi wan serbilind bibe (an jî – wan *xiyal bike*, ger hûn bixwazin!), her çendî, divê mirov li xwe mukur' bê, lêpovajîk'aran, ji bo ku k'arê xwe yê r'eş pêk bînin *hewlên “bêhemp'a” dane...*

LI ŞÛNA PAŞGOTINÊ

Destpêka sala 2024-an di malp'era r'ojnameya “Xwebûn” da bîranînên *Mûrad Elî*, nûnerê binemalek a k'urd a Bakûrê K'urdistanê hatibû weşandin.

Bi kurtahî bîranîn di derbarê wê da ye, ku piştî hinek lêger'înan xudanê nivîsê tê ser wê nêr'înê, ku pêkan e, wisa bûbe, beşekî malbeta pêşiyên wî, yên ku xaçp'arêz mabûne, di dema xwe da bi ermenîyên derva r'a çûbin Ermenîstana Sovêtê, û bir'yar dike, ew jî li dû şopa wan her'e wir, bi wê hîvîyî, ku hîç nebe şopeke peyhatiyên pêşiyên xwe bibîne, an jî agahîyekê di derbarê wan da p'eyda bike. Û bi vê armancê ew du caran ji Ewropayê li ser Gurcistanê r'a diçe Ermenîstanê (hezîrana 1993-an, paşê, rezbera 2017-an)...

Ev bîranîn p'ir' balk'êş in, ew serpêhatîyeka t'uje zelûlî (dramatik) a malbeteka k'urdî vedibêje, a ku ji sedema pêvajoyên dîrokî hatye p'arç'ekirin û ji hev dûrxistin, û bi demê r'a têk'ilîyên di navbera beşên wê da hatine windakirin.

Ji ber ku ev bîranîna t'êra xwe mezin e (8 rûp'elên pîvana A4), lewra jî, ezê li vira t'enê wî beşê wê bînim, ya ku dê bi me r'a bibe alîk'ar, ku em wan pirsan têbigihîjin, ên ku demeke dirêj net'avetî dane ne ku k'urdan t'enê, lê, her weha,– hinek hemwelatîyên nû yên Ermenîstana Sovêtê jî.

Waha:

“... Hevdîtineke min di Yêrêvanê da hebû, mim biryar kir, ku piştî wê, berî vegera xwe herim mala kalkê Harût, ji bo ku xatirê xwe jê bixwazim.

Dema ku ez dîtîm, pir dilşad bû, lê ku pê hesya, ku ezê sibetirê herim, pir ber xwe ket.

– Tu diçî, ji te ra oxir be, me pakî hev nedît, em bi hev ra têr neaxivîn... Ewqas tişt hebûn, ku ez ji te ra bibêjim. Dibe ku me bikaribûya bi hev ra şopa wan nûnerên windbûyî yên malbeta kalên te bidîta!

– Min ew dîtîm! – Ez ber gotina wî da hatim.

– Ha? Çi baş e! Ê, ew li kune? – Kalê lezobezo pirsî.

– Hûn in, koma te ye! – Min got.

Kalkê Harût herdû destên min girtin, weha li kurahîya çavên min nihêrî, ez hemêz kirim û got:

– Erê, rast e, me hev dît, lê, heyf, ew bi derngî pêk hat!

Wê demê min pîrsek da wî kalemêrê dinêdîtî, zane û bîrewar:

– Kalkê Harût, tu dikarî bibêjî, sedem çî bûn, ku piştî salên şêstî yên sedsala XX siyaseta dijinkirina kurdan di Ermenîstanê da pêş ket? Ma ne, dema bi dîrokî li pîrsê dinihêrî, ev dûrî heşmendîya mirovê tendurust e, ev dijî berjewndîyên netewî yên ermenîyan bi xwe ye jî...²⁸

Kalkê Harût hizingeke kûr rahişt, dîsa berê xwe da min, li kurahîya çavên min nihêrî û weha got:

– Sedem em bûn, kurê min, em bûn. – Ewî bêhneke kûr rahişt û axavtina xwe domand. – Tu min weha dibînî – îro ez kalemêrekî lewaz û ji hêz ketî me. Lê di dema xwe

²⁸ Hê sala 2012-an gotara *Ezîz ê Cewo* ya “Divê mirov r'astîyê bibîne” hatiye weşandin. Gotar di derbarê bûyerên bobelatî yên destpêka sedsala XX û t'evkujîya ermenîyan da ye di Împêratorîya Osmanî da. – https://www.academia.edu/124879080/DIVÊ_MIROV_RASTÎYÊ_BIBÎNE

da ez jî mîna we ciwan bûm. Ez pir aktîv bûm, min di rêxistina ciwanan da (jêra Komsomol digotin) dest bi karê xwe kir. Paşê ez di rêya Partîyê da pêşva çûm, min karê rêvebirîyê kirin. Gelek dost û hevalên min hebûn. Naha jî pêwendîyên min bi gelekên ji wan ra hene...

Ev pirs, a ku bala te dikişîne, ez jî bi xwe va mijûl kirime... Min jî ji heval û dostên xwe pirsye. Di encamê da min ji bo xwe tiştê zelal kir: me, kurdên xaçparêz, û heya ew ermenîyên ji Kurdistanê hatî, bi giranî weşanên radîoya Yrêvanê guhdar dikirin, di malên me da pirtûkên kurdî hebûn, rojnameya kurdî hebû. Me def-dewetên xwe bi sazbandên kurd û govenda kurdî pêk tanîn. Heya şînen me jî bi kurdî bûn. Û evê netewperestên ermenî tirsand, şûna ku vê yekê ji bo nêzîkbûn û dostanîya gelan bi kar bînin, rê û rêbazan geryan, çawa me çavtirsayî bikin. Û destpê kirin gotar û pirtûk di wê derbarê da binivîsin, xwedêgiravî (qaşo) kurdan bi tirkan ra tevkujîya ermenîyan pêk anîne.

Helbet, em tê gihîştin, ku ew peyamek e û mabesta wê jî em bi xwe ne, ku bi wê dixwazin ji me ra bibêjin: “Nişkêva nebe, ku hûn xwe li ser kurdan bigirin, bizanibin, kurd beşdarî tevkujîya ermenîyam bûne, ew dijmin in!...”

Em bi wî awahî bédeng kirin, hêdê-hêdî pêwendîyên me bi kurdan ra sar bûn.

Naha jî kurdên êzdî kirine hedef, li hember wan têrora psîkolojî dimeşînin, têza “êzdî ne kurd in” avîtine hole, û ev gîhandine wê astê, ya ku di dema xwe da li hember me bi kar anîn, a “kurd dijminên ermenîyan in, ewana ermenî kujtine!” Û hinek bêmejû ji nava beşekî êzdîyan derketine, gel ditirsînin. Ê, gelê reben çî bike, li wir malên wan hene, zarokên wan mezin dibin... ”²⁹

Erê-ê-ê, tiştê ku mirov li ser bide heşê xwe heye!

Ma ne, di dema xwe da, pêşîyên k’urdan p’enaberên ermenîyan sit’ar kirine, xak dane wan, r’êberê wan t’acîdar kirine û ji bo wan dewlet damezirandin, ... dem hebûye, nûnerên arîstokratîya ermenîyan ji bo xwe û binemala xwe r’êz û r’ûmet hejmartine, ku navê **K’urd** li lawên xwe yê nûbûyî bikin, heya xanedaneka t’am a ermenîyan a bi vî navî hebûye (di vê derbarê da – li jêrê, di Pêvekê da).

Û ji nişkêva, her tişt ne wisa ye, k’urd dijmin in! Ji bo çî, ew kêrî k’ê dihat?

Mirov dikare bi bawer bibêje, ku ne kêrî ermenîyan, ne jî kêrî k’urdan hatye!

Û li vira pirs sereke dertê hole: “Dijminahîya navbera k’urd û ermenîyan, lo, wisa jî, ya, bi giştî, navbera gelan, kêrî k’ê tê?”

Û ya dine! Balk’êş e, ji bo çî armancê li ser asta dewletê (û ew jî di Ermenîstana Sovêtî da, dema komûnîst li ser desthilatê bûn!) destekdarîya (sponsorî) wê siyasetê kirine? Û di wê derbarê da heya di p’irtûkên dersanê “Dîroka Ermenîstanê” da jî nivîsîne (!?).

Helbet, li ser van û pirsên dinê bi demê r’a bersîv dê bên dîtin, lê ji bo wê lêger’înerên bêt’eref, ên bê armancên veşartî û tarî, yê serbixwe pêwîst dikin, ên ku bikaribûna jinûva hemû boçûnên (aspêkt) dîroka hevbeş a lêpovajî û çewtkirî ya k’urd û ermenîyan binirxandana û ew wat’edar bikirana.

Evê berjewendîyên herdu gelan jî daxwez dikin, yê ku bi r’ayê ç’arenûsê 2500 sal berê bûne cînarên hev, û îro jî hê cînar dimînin, ew bi dilê hinekan be, an – na! Ewana bi hev r’a r’êyeka dîrokî ya dirêj derbaz bûne. Li ser wê r’êyê gelek tişt pêkahtine. Her t’enê pêwîst e, mirov bi heşmendî û serê sar li paşer’oja xwe binihêr’e, bûyerên dîrokî bi obyêkîvî binirxîne û bi bawer li pêşer’ojê binihêr’e. Ma ne. jîyan didome!

Û, lewra jî, eger mirov bi gotinên *M. Mînyan* bîne zimên, ... *pêwîst e, ji bo ku her t’erefek di derbarê dîrok, têk’ilîyên navêtnîkî, bawerîyên olî, daxwez, t’aybetî û nîgara gelên cînar da agahîyên r’astîn* ... *bide gelê xwe. Ewê bibe ewlehîya (garantî) wê, ku di navbera gelên cînar da dê tégihîştinên çewt, bêbawerî, hevnextwazî (antîpatî) û dijminahî r’ûnedin.*

T’enê weha – di navbera gelên cînar da dikarin p’ewendîyên cînarîya qenc û heya yekîtiyên siyasî yê herdayîm û aram hebin...

²⁹ Mûrad Elî, “Parçebûna gelê me çarenûsî ye yan na?” – <https://xwebun2.org/parcebuna-gele-me-carensi-ye-yan-na/>

T'OR'INÊN ERMENÎYAN, ÊN KU NAVÊ WAN K'UD BÛYE

Mîr K'ûrdîk (bi yewnanî: Κορτίκιος, sedsala IX – s. 892-an a serdema me).

T'or'inê ermenî di Vîzansê da, xudanê kelaha Lokanayê (ji vira jî navê wî yê dinê: **Mîrê Lokanayê**), lawê *Grîgor Mamîkonyan*, ji t'or'ina Mamîkonyanan, damezirînê xanedana (binemal) arîstokratî ya Kûrtîkosa, ango, binemala K'ûrdîkya (p'eyva yewnanî ya Κορτίκιος – Kûrtîkos ji a K'urdîk tê).

[https://hy.m.wikipedia.org/wiki/Բուրդիկ_\(հշխալս\)](https://hy.m.wikipedia.org/wiki/Բուրդիկ_(հշխալս))

Ohanavank' – dêra eremniyan a xristîanî, li ber r'exê r'astê yê ç'emê K'asaxê, di sedsalên IV – XIII da hatye avakirin.

Qubeya sereke di salên 1216-1221-an da bi daxweza mîr Vaçê Vaçûtyan hatye avakirin, Bergeha qubeyê **K'urd** ê lawê Vaçê, sala 1250-î lê zêde kirye.

... Pişt dîwaran va dêrika biç'ûk a 1500-salî ya Grîgorê pîroz, a ku li şûna p'ereştgeha p'ûtp'ereştan hatibûye avakirin, nayê xuyan, lê qubeyên bilind, ên ku mîrên **Vaçê û K'urd Vaçûtyanan** di sedsala XIII da avakirine, tên xuyan.

https://www.armgeo.am/kasagh_gorge/ ; https://patmakanhetq.com/photoinfo/ohanavanq_hovhanavanq/ и https://dzen.ru/a/YHBnR4SitxnXxDv9?referrer_clid=1525&

K'omer'êza p'ereştgehan a Saxmosavank'ê

K'omer'êza p'ereştgehên xristîanîyê ya ermenîyan a Saxmosavank'ê li gundê Saxmosavanê yê herêma Aragat'sotnê, li ser bilindciya milê çepê yê gelîyê K'asaxê ye. Di nava sazîya k'omer'êzê da dêra Dayka Xwedê ya pîroz heye, ya ku mîr **K'urd** ê lawê mîr Vaçê Vaçûtyan sala 1235-an avakirye.

<https://onewaytour.com/hy/sights-of-armenia/saghmosavank/>

Dêra li r'exê gundê Hart'avanê

Li r'ex gundê Hart'avanê yê navçeya Aparanê dêrek heye, ya ku sala 1244-an ji hêla mîr **K'urd** va hatye avakirin.

http://aragatsotn.mtad.am/u_files/file/hարթաւլաւս.pdf

Gundê Vardênîsê yê mîr K'ûrd

... Tê gotin, ku Hêtûm ê qralê Ermenîstana Kîlîkiyayê dema r'ewîtîya xwe, li ser Kafkasîyayê r'a berbi bajar û herêmên dinê va didomîne... Û, piştî heyşt mehan r'êya wî li gundê Vardênîsê yê mîr **K'ûrd** r'a derbaz dibe û ji wir û pêva ew r'êya xwe berbi malê va didomîne. 5-ê hezîrana 1256-an ew vediger'e Kîlîkiyayê.

<https://qahana.am/leaders/84>

K'omer'êza dêran a sedsalên navîn (gundê Yêrincatap'ê)

Ev k'omer'êza dêran li r'ex ç'emê K'asaxê, li ser girekî biç'ûk hatye avakirin... Wek ku li ser dîwarê hindur'în ê dêrê sala 124-an hatye nivîsîn, k'omer'êz bi destekdarîya (sponsorî) mîr **K'urd Vaçûtyan** û **Xorîşaha** xanima wî hatye avakirin.

<https://ok.ru/group/51889194991792/topic/61465088636336>

Dadîvank'

K'omer'êza monastiran li bakurê ç'emê Têrtêrê, li navçeya K'elbecarê ya Azerbaycanê ye.

Di heman k'omer'êzê da jî hema dêra navendî ya Arzû-Xatûn Artsrûnîyê ye.

Ev dêr ji hêla Arzû-Xatûn Artsrûnîya xanima Vaxt'ang ê mîrê gewre yê Hat'êrkê va sala 1214-an hatye damezirandin. Li ser dîwarê wê nivîsarek a dirêj a ji 19 r'êzan bi hûrbînî di derbarê Arzû-Xatûnê û ji hêla wê va damezirandina dêrê da vedibêje:

“Bi dilovanîya Bav-Xwedayê herî bi hêz û Lawê wî yê tayê t'enê Îsa Mesîh û bi dyardariya R'uhê Herî Pîroz, ez, benîya sergerdenî ya Mesîh – Arzû-Xatûna dota mîrê mîran K'urd ê gewre û xanima şahzade Vaxt'ang ê desthilatdarê Hat'êrkê û t'evahîya Xaçêna jorîn, min bi hêvîdarîyek a mezin li ser cîyê gor'a mêrê xwe û lawên xwe – Hesenê nixurîyê xwe û Grîgor, ên ku di zar'oktîyê da çûne bal Xwedê, P'ereştgeha pîroz a navendî ava kir... ..”

<https://ru.wikipedia.org/wiki/Даливанк#Фотогалерея>

<https://imyerevan.com/hy/society/view/2944/>

Wisa jî balk'êş e:

Нахпат

Di navbera sedsalên 12-13-an da Haxpat, wek ku t'evahîya herêma Alavêrdîyê, bûn mal û milkê Zak'arîyanan, an Mxargrdzêlîyan (bi gurcî – çepildirêj) – jî bo têk'oşîna serk'evtî li dijî misulmanan ev **binemala k'urdên xristîanbûyî**, yên ku xizmtîya wan bi binemala Bagratûnîyan r'a hebûye, wek vassalên p'adişahên Gurcistanê, Ermenîstan di bin desthilatdariya wan da bûye...

<https://dzen.ru/a/Yop7sHbDIylqcIR5>

Bajarê Pyatîgorsk/R'ûsîya – r'ezber/cotmeha sala 2024-an.

Binenimûneya wê ya bi r'ûsî li vir e:

https://www.academia.edu/124824721/ТАВРСКОЕ_СОБРАТСТВО_СИМВОЛ_БЛАГИХ_НАДЕЖД_ИЛИ_НЕСБЫТОЧНАЯ_МЕЧТА

Hatye weşandin:

https://www.academia.edu/124922849/HEVBIRATIYA_TOROSAN_SEMBOLA_HEVIYEN_QENC_AN_XIYALEK_A_NEPEKAN